


PolitikART

15 GÜNLÜK EDEBİYAT SANAT VE DÜŞÜN DERGİSİ

10 Ocak 2015 Cumartesi

SAYI: 156



Rê û resmên
Kurdî

Kovara çandî û wêjeyî PolitikART ku heta niha hemû hejmarên wî bi Tirkî bû, ji niha û pê de wê sê mehan carekê bi Kurdî were weşandin. Emê hewl bidin têkil-darî wêje, çand, jiyana civakî û nîrxên Kurdan PolitikART ên bi mijar û babetên rengîn bigihînin we. Mîna destpêka vê xebatê vê hefteyê bi mijara "Rê û resmên Kurdî" hejmareke têr û tije û xwerû Kurdî bi kêfxweşiyê mezin ji we re pêşkêş dikin.

Axa Mezopotamya ya şarîstaniyê jê dest pê kir û di himbêza xwe de bi dehan şarîstanî afirandin ji aliyê zanyar û dîroknasan ve jî mîna dergûşa şarîstaniyê tê binav kirin. Mîna gelê qadîm yê vê axê Kurd jî efrînerê destpêkê yê şarîstaniyê ku tê wateya mirovbûnê ye.

Lê belê ji ber şer, talan, mêtîngerî û înkare, hêzên serdest hewl dane çand û kevneşopiyên Kurdan ji holê rabikin. Beramberî talana xweza, dîrok û çanda Kurdistanê ku bi dehên salan meşandine, Kurd hebûna xwe diparêzin. Bi sersal, Newroz, şahî û hwd. hemû jiyana Kurdewarî bi tevahiya nîrxên xwe li hemberî qir-kirinê li ber xwe dide. Lê ji bo em vî mirasî bigihînin nîfşên li pey xwe divê em wan biparêzin û bidin jiyîn.

Me jî hewcedarî dit ku di hêjmara yekem a vê salê de, bi nivîsên PolitikARTê em careke din van nîrxên Kurdan ên bûne malê tevahiya mirovahiyê destnîşan bikin û binîrxînin. Em hêvî dikin ku nivîs û naverok li gori dilê we be...



Jinên Kurd hirîya ku pê doşek, lihêf, balîf, merş, kinc û pêdiviyên din ên malê jê çêdikin dişon. Şunikên di destê wan de, yên pê gemara di nava hiriyê de paqijî dikin, sembola kevneşopîya ji serdema neolîtîkê heta roja me ya îro ye.

Naverok...

Efsane, rîtuêl û avakirina nasnameyê/

Luqman GULDIVÊ Rûpel 4-5

Sersala Kurdan/

Medenî FERHO Rûpel 6-7



Sembolên kurdan
ên mîtolojîk

Îkram ÎŞLER

Rûpel 8-9

Şîrê xav ê dayikên me.../

Xelîl DALKILIÇ Rûpel 10-11

Awaza bi cesaret a jinê Banû Şîrwanî/

Kakşar ÖREMAR Rûpel 12-13

Mêjûyê Bêsî/

Abdullah DEMİR Rûpel 14

Zimanê qedexê û evîna xwendinê/

Nesrin NAVDAR Rûpel 15

Herausgeber:

Medya Presse-und Werbeagentur GmbH
Hans-Böckler-Str. 16
63263 Neu-Isenburg

Geschäftsführer:

İzzet Akcin

Ver.Redakteur:

Özgür Reçberlik

politikart@yeniozgurpolitika.org



Bi destpêka zivîstana dijwar û berfê re ji bo derbaskirina demsalê û mayîna li benda biharê berê xwe didin germiyanan. Ew koçerên rêya dûr in. Yên ku temenê xwe di rêwîtiya navbera zozan û germiyanan de derbas dikin.

Sara, xeta azadiyê ye

Têkoşîna Azadiya Jinê a Kurdistanê bi rêbertiya Heval Sara, afirîneriya wê û nirxên ku bi xwedan û berxwedanê xwe çêkiriye hatiye heta îro. Bi van nirxan Sara, di dilê hemû jinên êvîndarê azadiyê de cih girtiye. Sara, di heman demê de di Têkoşîna Azadiya Kurd de pîvana civakbûnê ye.


► Dilzar DİLOK

Însan dîrok e. Çand dîrok e. Gotin dîrok in. Danûstandin bi tevahî dîrok in. Rastiya insan a ku dem û cih derbas dike dibe malê dîrokê. Heval Sara, ev qonaxên dîrok û dîrokbûnê di tevahiya jiyana xwe de bi cih kiriye û temenê xwe bi temamî kiriye demeke awarte û biserketiye. Tevî wê yekê Heval Sara ji me hemûyan re nişan daye ku kûrbûna wê ya azadiyê hem dema xwe hem jî cih û mekanê xwe derbas kiriye. Bi راستiya Sara, kaniya hebûnê ya azadiya civakê ku ji destpêka mirovahiyê heta îro herikiye di bedena jinê de xwe jî nû ve daye der. Weke ku bi راستiya Sara çemê dîrokê biherike û xwe bigihîne îro.

Sara bi têkoşîna xwe nişan daye ku sosyalizm di راستiya jinê de çawa berbiçav dibe, çawa jî nû ve jîn dibe û jî hemû cihanê re dibe hevî û çawa idealên wê jî nû ve jîndar bike. Ya rastî, Sara hiştiye ku sosyalizm jî nû ve were dinê. Rihê Rozayan jî nû ve aniye bîra her kesî û jî hemû cihanê re ragihandiye ku azadiya azadiya jinê gengaz e. Ji ber wê yekê ew ne tenê jî bo jinên Kurdistanê, jî bo hemû jinên Rojhilata navîn û yê têkoşîna azadiya dimeşînin, jî bo tevgerên sosyalist, demokratik û azadîxwaz û jî bo hemû jinên cihanê yê dixwazin azad bîjin nîrxêke giranbûna ye. Pîvanê vî nîrxî û şehadeta wê bê guman ne tenê hestîrên çavan, jana dil û xemgîniye. Lê di şa jî jî bo kesên weke me yê bi daneyên berbiçav fêr dibin, ev dikare weke daneyek were qebûl kirin.

Yek ji pîvanên PKK, têkoşîna demdirêj a bê navber e. Sara jî yek ji çavkanî û pêşenga vê têkoşîne ye. Yek ji ferqa PKK a jî rêxistinên şoreşger, militanên jin ên pêşeng in. Her yek jî militanên di têkoşîna azadiyê de cih digirin, bi serketina xwe PKK jî kirine partiyeke serketine û bi berxwedariya xwe cewherê berxwedanê yê PKK afirandine. Bi idîaya xwe ya têkoşîne hiştine ku PKK jî bibe partiyek ku biryardariya wê ya têkoşîne demdirêj bibe. Her militanek ev taybetmendî jî şehîdan, jî pêşengên çavkaniya PKK û serokatîya wê dewr girtine. Ev carna yekser, carna jî bi şopên nîrx û berhemên pêşengên xwe yê di jiyane de wergirtine. Her yek jî militanên PKK, ev hucreya bingehîn girtine û çalakiya herî mezin, afirandina kesayeta nû pêk anîne. Çalakiya herî mezin a her yek jî militanên PKK, xwe jî nû ve çêkirine.

Sara, çalakiya xwe ya demdirêj û herî mezin di kesayeta xwe de pêk aniye. Hemû jiyana xwe keli bi keli kiriye çavkaniya vê çalakiyê. Ev weke hunermendekê bi xweşikbûnê, weke militanekê bi cesaret û cidîyeteke mezin, weke jineke bi biryar, parvekirin û fedakariyeke mezin ev çêkiriye. Ev rûyê jinê, hiş, mejî û zekaya jinê ya herdem û hemdem e. Di her jineke ku li ber xwe dide, yek jî rayê berxwedana Sara heye. Di her jinek û



têkoşerekê ku karibe têbikoşe, şer bike û vê bide ber çavên xwe, cesareta vê nişan bide, di her jineke qasî ku têdikoşe karibe jî bo rêhevalên xwe û dîroka têkoşîna azadiyê nîrx û wateyên nû biafirîne, ev rayê berxwedana Sara heye.

Ew راستiya xwedavendan ku bi lêgerînên Sara yê jiyane tovê wê şîrîn bûye û di zindana Amedê de derketiye holê, di tevahiya salên şoreşê de mezin bûye, şîrîn bûye, şitlên xwe daye û bûye dareke azadiyê ku bi siya xwe karibe sed hezaran insan bixewîne.

Ya ku hiştiye ku PAJK rêbertiya bîrdozi a sedsala 21. bike jî ev e. Çend saat be jî yê ku bi heval Sara re mabe di zanebûna vê راستiyê de ye. Di her rewşê, di her şert û mercî de pîvan û xeta PKK diparast. Ew xet û راستiya PKK di kesayeta xwe de jî bi cih kiribû. Eger were pirsirin ku "Pîvanên PKK bi zeka, têgihîştin û girêdana jinê dikare çawa were nişandana?" bersiva vê; "Nêzikatî, uslûb û sekna jiyane ya Sara" ye. Heval Sara jiyana xwe bi agirê têkoşîn û berxwedana xwe daye jiyîn. Tevî wê yekê beyî ku bibe xweli jî nivê pêla vî agirî jî nû ve xwe afirandiye. Sara, qasî meşandina berxwedanê, di warê demdirêj kirina vê berxwedanê de jî xwedî tecrûbeyên mezin bû. Bi vê yekê nişan dida ku jiyana bi awayekî mekanîk, dogmatîk û jiberkirî nikare were jiyîn.

"Dema enerjîya insan ya jiyana û berxwedanê bi awayekî hosteyî bi politikayê re bibe yek û di wê qadê de berê xwe bide hedefên rast, wê demê enerjîya xwe dide wir, hestên xwe jî wir digire û jî wê atmosferê li her tiştî dinêre. Di vê noqtê de agirê siyaseta dişewitîne, kes nas nake. Hêza te, enerjîya te bi dijwari jî biherike eger siyaseta te di hundirê rêxistinbûn û şerê wê de cihêkî saxlem negirtibe, wê tê li vir û li wir bide. Tu jî van hejandinan û bêstîkrariyê nikarî xwe rizgar bikî."

Ev gotinên Heval Sara, راستiyên ku jî jiyana xwe niqûtan diye û bi me re par ve kirine. Ev di heman de nişaneya nûberbûna hucreya bingehîn e.

Dema li Libnanê li cem Serokatîyê bû jî ber jî lingê xwe ameliyat bûbû nikaribû biçe çiyayê Kurdistanê. Wê demê jî Hevalê Zamanî re weha gotibû: "Ji xwe min bi mirinê re peyman mor kiriye. Ew jî min ditirse. Heta ku ez azadiya Kurdistanê nebinim ezê nemirim. Divê ez nemirim ne wisa?" Ev gotin idîaya jiyana bi wate a Heval Sara diyar dike. Bi heman idîa, bi heman êvîna jiyane di heman sedsalê de Hevala Zilan bi bedena xwe li Dersîmê berê xwe da çalakiyê û ev ne tesadûfî bû.

Dema Serokatî Heval Sara bi rê dîke, hevîya xwe ya serketinê tine ziman: "Hayde Sakîne, tu jî çiyayan hez dikî. Bawer dikim tê li çiyayan bidî û bi wan re bibî yek! Ez li benda agahiyan serketina te me." Ev gotin, qasî hevîyan Serokatîyê, راستiya Sara ku Serokatî di kesayeta wê de dibîne jî nişan dide.

Îro PKK, bi wan pîvanên ku Heval Sarayan afirandiye li ser piyan dimîne û hewl dide vî rihî û van pîvanan bigihîne hemû cihanê. Sara pêşeng û rêbera vî xetî û awaya nûjen a xeta azadiyê ye. Ne tenê ku xwe bi PKK û sedsalê re bike yek, weke xwedavendekê azadiyê xeta azadiyê nûjen kiriye. Ev pîvanên ku bi têkoşîna xwe afirandiye derbasî nîfşên din û têkoşerên sedsala îro jî kiriye. Ji ber wê yekê Têkoşîna Azadiya Jinê a Kurdistanê bi rêbertiya Heval Sara, afirîneriya wê û nirxên ku bi xwedan û berxwedanê xwe çêkiriye hatiye xeta îro. Bi van nirxan Sara, di dilê hemû jinên êvîndarê azadiyê de cih girtiye.

Sara, di heman demê de di Têkoşîna Azadiya Kurd de pîvana civakbûnê ye.

Pîvana Sara, nişaneya yekîtiya jinan a paradigmayekê, jiyane û biryardariya têkoşîna azadiyê a hevpar e.

Pîvana Sara, îspata hebûna azadiyê a bi rengê jinê zekaya jinê û jiyana jinê ye.

Pîvana Sara, nişaneya azadiyê a bi meşandina berxwedan û têkoşîne ye.

Pîvana Sara, pîvana hebûna însaniyeta me ye.

Efsane, rîtuêl û avakirina nasnameyê



Di avakirina nasnameyên civakî de efsane bi dewreke sereke radibin. Ji bo avakirina nasnameya netewe û yekeyên civakî yê modernîzmê efsaneyên gelêrî, rîtuêl û mît kewarekê pêk tînin. Nexasim ji elitên neteweyî yê ku di avakirina nasnameya netewe de bi dewra motor rabûn, bi avakirina maneyên nû daketin.

avakirina civaka/en "kurdi" de binihêrin.

Di navbera xeyalî û rastiyê de civak

"Civatên xeyalî" piştî ku Ernest Gellner sala 1964'an behsa wan kir, di salên 1980'yî de bi pirtûka Benedict Anderson a bi navê "imagined communities/civatên xeyalî" veguherî tegeheke bi tesîr. Tiştê jê re analîza peyvê (discours analysis) û teoriya peyvê (discours theory) tê gotin bi Foucault û Derida di nava civaknasiyê de tesîreke mezin kirin û pîr alîkar bûn ku em iro hêsanitir li avabûn û xebitîna civakan serwest bibin. Civatên xeyalî weke tegeh îşaret bi wê yekê dike ku etnisîte, netewe û yekeyên din ên civakî di rastiyê de xeyalî ne; dirokeke wan bi hev ve girê dide yan ji berjewendiyên wan ên ku ew qaşo bi wan dizanin nînin ku dikin ew civakekê pêk binin, lê belê baweriya ji van tiştan e ya ku wê civakê ava dike. Dewra sembolên zimani, efsane, mît û diroka lihevhatînan û çêkirî ye. Ji ber wê ji civakên pêk

hati ne xwedî sedemeke rasyonel a mirov dikare fêm bike ye, ew xeyalî ye, xwe dispêre fiksiyoneke yan ji konstruksiyoneke civakî.

Di fikra xwe ya ji bo baştir têgihîştina li wê yekê ji Anderson li sembolên herî bikêrhatî yê netewe dinihêre, angû li gorê rûmetê û gorê eskerên meçhûl. Li gorî Anderson ev sembol ji ber wê yekê evqasî bi kêr tînin û xwedî tesîr in, ji ber ku yan ti kes nizane ka kî di wan goran de ye yan ji ew gor bi temamî vala ne. Angû çawa ku ji civaknasên navdar ên destpêka sed-sala bihurî yê elman Max Weber gotî, netewe û nijad xwe dispêrin peyvên ji maneyê vala, gorê rûmetê û gorê eskerên meçhûl ji li gorî Anderson vala ne û ji ber wê ji bi kêr tînin. Helbet hem Weber û hem ji Anderson berê awira xwe didin "netewe" dema van gotinan, dikin lê belê ji bo wan civak bi giştî ji bi heman şewazî ava dibe. Anderson e ku bi temamî li gorî ekola postmodern bingeha fikra xwe datîne, di her tiştê de konstrukeke civakî, bi manebarkirinê zimani peyda bûna rastiyên mirov tê digihîjin fêm dike.

Efsane û rîtuêl, mît û rêûresm di avakirina civakan de weke ku xwedî dewreke esasi bin, tînin nirxandin. Fikra ku dibêje, efsane di avakirina nasnameyên cihê de bi roleke grîng radibin, nû nîne. Herçî ew fikr e ku civak xwedî destpêkeke jenaolojîk in û di nava endamên civakê de girêdaneke ji wê destpêkê heye, ji xwe îdia dike ev efsane, mît û rêûresm gotin yan ji nivîsandina diroka ne. Nexasim ji sed-sala bihurî di warê têgihîştina dewra zimên li ser gihîştina di dinyayê de bû şoreşek (linguistic turn); girêdayî wê bipêşketina analîza peyvê/niqaşê (bi maneya tevahiya bikaranîna zimên û axaftinê di nava çarçoveyên civakî de) destûr da ku mirov bi awireke nû li dewra zimên û formên taybet ên zimên (speech acts) di avakirina civak û nasnameyan de binihêre. Em ê ji di wê nivîsê de li dewra mît û rîtuêlan di



Lê Andrew D. Smith bixwe pêşengiya ekola etnosimbolizmê kir ku di lêkolina netewe de giringiya sembol, mit, nirx û rûreşman derxist pêş. Wî ne bi tenê rexne li modernîzmê girtin ku fikra kevnbûn û ji mêj ve hebûna netewe derxist pêş, wî di heman demê de rexne li postmodernîzmê jî girtin, ji ber ku wê di her tiştê de konstruktên civakî diditin. Ji bilî grîngiya sembolan, Smith her weha çîhebûna etnisîte û netewe jî derxist pêş û etnisîte (ne bi maneya hişk û teng a antropolojîk, lê weke yekeye civakî ku mirov texeyul dikin heye) bi rengê ke weke bingeheke netewe didit (heta ji bo neteweya emerîkî jî). Li gorî Smith mitoloji, rituel, wêjeya devkî bi giştî kewarek in ji bo elîtên dixwazî netewe ava bikin û ew jî ve kewarê tiştê ji wan re divê û bikêrhatî dîneşînin.

Dema em berê xwe didin van hizrên li ser nasnameyên civakî (nexasim jî etnik û neteweyî), em dibînin ku di tevahiya wan ên postmodern û rexnegirên wê de sembol (dîrokî, mitolojîk, efsaneyî, rituelî û rûreşmî) himeke ji bo avakirina nasnameyan û li vir ez peyva avakirina nasnameyan jî qebûl dikim ku ji bo bikaranina me di vê gotarê de li cih e. Baş e, di nasnameya/ên Kurdî de sembolên çawa ji bo çî hatine bikaranîn? Rituel û efsaneyên di nava civakê de bi dewra avaker ji bo nasnameya wê radibin hene? Heke hene ev çawa dixebitin? Ji bo bersiva van pirsan mirov berê xwe bide civaka serdema me ya pîrranî bajarî û civaka beriya demê kurt û tîkîliya di navbera herduyan de binirxîne wê bikêr were ji bo bersivdayîna pîrsên jor.

Ji nû ve hûnandina maneyan bi rituelên nû

Mit yan jî efsaneyêke destpêkê ya miletekî yan jî neteweyekê (yan jî her şewaz yekeyên civakî) ji bo weke civak bikêrhatin û xebitîna miletî yan jî neteweyê yek ji esasan be, hingê di repertuwar yan jî paşxana civaka/ên Kurdî de çî heye ku bi kêra avakirina wan nasnameyan were? Bawer dikim her kes li ser bersivê hemfîr e, dema ku bersiv mîta Newrozê be. Mîta Newrozê li dor rûreşma sersalê hatiye avakirin. Destpêka wê diçe heta bi civakên neolîtîk ên destpêkê yên ku bi tevahî girêdayî çandiniyê bûn. Ji bo wan dewra salê heyatî bû. Erda çandî û bereketa wê bi dewra salê ve girêdayî bû. Şahî, dewlemendî jî, xela û felaket jî elaqedarê wê bûn. Ango ji bo barkirina maneyên pirrengî yên sersalê (weke Newroza destpêka biharê) her tişt heye: dawîya zivistanê ku zexîre û qûtê salê kêr dibe yan jî namîne sedema tirsê ye, lê destpêka biharê jî hêvî ye ji bo sala li pêş a bi bereket. Dirêjkirina zivistanê yan jî diwarbûna wê ber bi dawiyê ve dikaribûn ji bo tevahiya civakê veguhere felaketeke mezin, lê di wextê xwe de hatina biharê, baranê û jîyanberbûna xwezayê jî dikaribûn bibin sedema dewlemendî û xweşiyê. Jixwe ji ber wê jî Newroz (li pîrraniya deveran bi tenê [ji gelek sersalan] sersal[ek]) navek jî be rîzek rituelên din, bawerî û maneyên din lê barkirî ne û ji navekî û wê de ye. Herçî nav in (weke signifikant) ne statîk in û li gorî maneyên civakî yên li wan tîr barkirîn di nava herîkekê de ne. Wê herîkê kiriyê ku Newroz weke komeke rituelên binê salê û serê salê di nava civakê de cihê xwe bi navên cihê bigire.

Qet şik û goman têde nîne ku dawîya zivistanê û rojên zîpa di vê teqîma rituelan de xwedî dewreke sereke be. Weke rojên dawî yên zivistanê û rojên destpêkê yên biharê di nava Kurdan de tîr zanîn. Rojên Hamaspathmaêdaya di rûreşmên kevn ên Îranî de dikarin aliyê ayînî û rituelî yên wan rojan hêsanîtir bi me bidin fêmkirin. Di Yaştê sêzdehan a Avestayê de ku weke Yaştê Fravaşî tîr nasîn, behsa deh şevan tê kirin ku Fravaşî (rihên pêşyan) tîr dinyayê. Li vir wê ne şaş be mirov di girîngî îşaretê de bike ku Yaştê bi pîrranî wê

beşa Avestayê pêk tînin ku metnên wê jî beriya Zerdest in. Ji bo van deh rojên ku Fravaşî li dinyayê ne, peyva Frawardîgan ango rojên Fravaşî tîr bikaranîn. Xelk van rojan dixwaze rihên pêşyan xwe bi valakirina malan, amadekirina cilûbergên paçij û amadekirina xwarin û şîr ji xwe razî bike. Ev roj rastî deh rojên dawî yên teqîma îranî ya kevn tîr. Ango rojên zîpa jî kêr û zêde rastî vê demê tîr.

Çarşema dawî ya sala Îranî ango çarşema beriya Newrozê, çarşemê sûrî ye. Li gorî adetên heyî, şeva vê rojê mirov diçin serê banan, agir dadîdî û di ser wî agirî re diqevizin û dibêjin, heyva Sefer (meha dawî ya teqîma Îranî) derbas bû û felaket jî pêre. Ev roj di rûreşma Kurdî de (Tor û Hekarî) weke çarşema sor tîr nasîn.

Di rituelên Kurdî de hîna jî maneyên dijberê hev li çarşeman û nexasim jî li çarşema sor û çarşema reş tîr barkirîn. Heman maneyên dijberê hev û nakok li zîpa jî barkirî ne: Dawîya zivistanê ya ku dikare dijwar be û bibe sedema felaketeke (weke xelayê, nemana zad û qût û tiştên bi vî rengî) û destpêka biharê ku ruhhatina bi bedena dinyayê bi xwe ye (reng, xeml, bereket û wekî din). Beriya çarşema sor jî çarşema reş heye. Van herdu rojan jî li Botan û Torê xelk jî malên xwe derdikevin, diçin seyranê. Mana li hudurê malan weke bêqidoşiyê tî dîtin, dikare re weke li ber pêkhatina felaketan. Li vir em girêdan û peywendiyên di nava hev de hûnandî yên civaka çandiniyê, fikra wê ya gihiştina di dinyayê de û ayina wê dibînin. Jixwe bi beriya mehekê destpêkirina rituelên elaqedarî Newrozê nişan didin ka ji bo civakên Kurd ên beriya bi sedsalan çawa ev dema salê heyatî ye. Li bajarên jî cihê Newrozê çiçaqî ayînî be (dadana agirî pîroz) ewqasî jî ji bo hevdişînan civakî derfetek e (binîhêre li hevdişîna Mem û Zînê di efsaneya Memê Alan û di berhema menzûm a Ehmedî Xanî de).

Newroz û efsaneya Kawayê Hesinkar

Heke wisa ye, ji bo çî îro em van aliyên Newrozê û çarç-



Di nava Kurdan de em rasta gelek "sersalan" tîr. Ji bilî Newrozê û Çarşema Sor, peyva "Sersala Kurmancî" di nava gelek civakên Kurd de belav e. Ev sersala miladî bégoman îşaret bi hevbandorkirina civakên Kurd û yên Ermenî, Suryanî, Kildanî (ku mesîhî ne) dike. Lê belê dîsa jî fikra "serê salê û binê salê" îşaret bi heman fikra sersalê ya Kurdan dike.

veya pîrozkirina Newrozê weke girîngtirîn dema salê di jiyana civakên Kurd ên beriya modernîzmê de nabin û her wê li dora efsaneya Kawayê Hesinkar digerin. Gelo ev jî xwe re wisa li hev hatiye? Dema ku mirov li dîroka tevgerên siyasî yên Kurd binîhêre û bibîne, tevgerêke siyasî ya bi heman navî jî hatiye damezrandin, hingê wê rast nebe mirov vê weke jî xwe re li hev hatî binirxîne. Kawayê Hesinkar dibe figurek ku nasnameyêke neteweyî lê tîr barkirîn (ew beriya hertiştî Kurd e), ew di heman demê de dibe qehremanekî neteweyî (rizgarkirina Kurdan û tevahiya miletêbê deverê jî zilma Dehaqî). Di heman demê de maneyên nû yan jî cihê li efsaneya Newrozê jî tîr barkirîn: êdî ew gotina serhatiya pêkhatina neteweya Kurd e. Dema ku ev maneyên nû cih û şûna mane, rituel û rûreşmên beriya xwe digirin rastîyêke nû diafirînin û ev rastî jî gihiştînin nû yên li dinyayê ifade dikin. Ew di heman demê de îdîa dikin ku ev mane tîmî hebûn û rastî her ev bû. Gelo, divê ku ev yek bivênevê bi vî awayî biqewime? Helbet na; lewma tîmî rûreşmên alternatîf jî xwe re kanalan peyda dikin û dikarin maneyên alternatîf zindî bikin.

Ji ber wê yekê di nava Kurdan de em rasta gelek "sersalan" tîr. Ji bilî Newrozê û Çarşema Sor, peyva "Sersala Kurmancî" di nava gelek civakên Kurd de belav e. Ev sersala miladî bégoman îşaret bi hevbandorkirina civakên Kurd û yên Ermenî, Suryanî, Kildanî (ku mesîhî ne) dike. Lê belê dîsa jî fikra "serê salê û binê salê" îşaret bi heman fikra sersalê ya Kurdan dike ku maneyên nakok di nav xwe de dihevîne. Dîsa rituelên weke "Pîrê Salê" ku sala derbasbûyî bi gewde dike û "Bûka Salê" ku sala nû bi gewde dike, xisletên avakirina Kurdî ya rituelan dike.

Rituel û manebarkirîna alternatîf

Heke jî bo civakan hîmê avakirina wan, avakirina wan fikr û maneyan e ku nasnameya wan bi gewde dikin, hingê nasnameyên gelêrî bi gotina Smith kewarên bi kêr hatîne ji bo avakirina maneyên nû. Lê belê manebarkirîna neteweperest bi destê elîtên netewe-afirîner heta îro bêhtîr rê vekir li ber peydabûna civakên rehet tîr birîvebirin. Fikra ziya-retên modern bi navê gorîn eskerên meçhûl jî bi vî awayî dixebite. Lê li hemberî ve afirandina qehremanên li ber xwe didin ên nasnameyên cihê jî tîr xwe serketî ne.

Bi ya min, heke çînen serdest, dewlet û kirdeyên din ên hegemonîk dikarin maneyan li peyv, efsane, rituelan bar bikin, hingê nasnameyên cihê ku di warê civakî û çîni de bi pîrranî bindest in, divê karibin maneyên alternatîf li wan bar bikin. Ev maneyên alternatîf dikarin xwe bisîpîrîn rabihuriyê û rûreşmên nişfêz bihurî yên ku civak û jiyana xwe manedar dikirin. Jixwe yek jî rûreşman e di wêjeya devkî de ku bi form û formulayên (koma peyvyan a sembola tiştê) heyî, rewş û tiştên nû ifade bike. Ev rûreşma li xwe heyirî namîne, şerên şûrûmortalan ên rabihuriyê dike şerê kozîkanê e serdema me. Heke wisa ye, çima em civaka xwe bisîpîrîn rûreşmên xwe, nasnameya wê bi efsane û rituelên wê jî nû ve ava nekin!

Peyv di warê maneyê de herikbar in; ev peyvên ne statîk û herikbar jiyana me û civaka me manedar dikin. Azadîya me jî di vî warî de di hunera me ya manebarkirîna de ye. Lewma heke em dikarin maneyên xwe avabikin, em civaka xwe û jiyana xwe ava dikin. Ji bo avakirina civakan û maneyên civakan ava dikin, rituel bi dewreke diyarker radibin. Hingê jî ayin, rituel, mit û efsaneyên civakê yên heyî jî bo parastina nasnameya civakî û pîrcurebûna civakî bivênevê ne.

Sersala Kurdan



Medeni FERHO

Di bin siya dara pelzêrin de, Kawayê Hesinker û gelê Kurd ji bo jiyaneke bi rûmet, azad û bextewar têdikoşin. Ji berdêla mirinê jiyane diparêzin, ji berdêla kolletiyê azadiyê diparêzin, ji berdêla rîtalî û netuyî, rizgariyê û jiyana hevreyî ya bextewar diparêzin. Ev têkoşîna dibin mercên gelekî giran û zor de pêhat, bi zafernameyêke dirokî tacîdar bû, ne tenê gelê Kurd tevahiya gelên heremê rizgar kirin.

Me di destpêkê de hinek vegotinên dirokî û efsaneyî li gel hev rêz kirin. Ev teva ji bo baş fêmkirin û têgihiştina wateya Newrozê bû û giring in. Vêce, lêkolîn û lêgerînên nivîskarên Kurd bi zîmanê dayikê wê ji bo nîfşê paşerojan bibin bingeh.



Em bi helbesta Ehmedê Xanî dest pê bikin; Destana qalkirina Newrozê Navdanîna demsala kêfxweşî û şadûmanî Bi awayên toreyên kevnar ên Kurdistanê Ku wan nave wê Sersal danî Û wek cejna hevghîhana yaran bi hesab danî

Ligel Kurdan piroz kirina sersalê gelekî cûda ye û xwe di dema bêdemiyek berfireh de destnîşan dike. Aliyê xwe ye felsefîk heye, aliyekî xwe ye hiyerarşik ji heye. Di vê hiyerarşiyê wek daristanekê her cûra darmêwe û hîfş hene... Kurdistanê bi vî rengî tê nexşe kirin. Li gorî hişmendiyê Zerdestî ku dibêje, di ava herîk de du çaran şîştin çênabe. Lê kevneşopîya Kurdistan û gelê Kurd pîrkultûrî û pîr gelî ye. Di her demjiyana dirokî de ev taybetmendî û xisleta piroz li Kurdistanê hatiye parastin. Îro jî, di şerê sêyemîn yê çîhanê de ku di kesayeta Suriyê de derketiye û navendî mina şerê yekemîn yê çîhanê, car din bûye Kurdistan, Kurd tevahiya gelan û nîrxên mirovahiyê diparêzin. Ji bo Kurdan, dirok dubare dibe: Dema ku Kawayê Hesinker ciwan ji hovîtî û faşizma Dehak rizgar kirin, ne tenê ciwanên Kurd, tevahiya ciwanên gelan ji kuştinê rizgar kirin.

Di çanda Kurdan de sersal

Di sersala Kurdan da "Kalê Salê" heye, sala bûrî temsil dike; "Ciwanê Salê" heye, sala nû temsil dike... Lê di aliye zanistî û jiyana abadanî de "Bûka Salê-Jiyana Ciwanîk" heye, ew jî jiyane temsil dike. Di sersala Kurdan de "Kalê Sale" bi sale re diçe, "Ciwanê Sale" bi sala nû re dikeve dewsa wî; "Bûka Salê", "Jiyana Ciwanîk" e naghure. Jiyana Abadan e...

"Qirdik" jî heye!... Di sersalê de, kesayetê herî giring e. Rûwê wî boyax kirî ye, cilê wî qetiyayî ne, kumekî rengin bi gulik li serê wî ye, bi ketina malan de ew dest bi axaftinê dike. Gotinên qirdik giring in; bijartî ne. Ji ber ku "Qirdik", civakê temsil dike.

Bûka Salê; jî nave wê jî diyar e, keç e û zindî ye, ciwan e. Bihar e û dayik e...

Hişmendiyê ideal temsil dike, zindî dihêle, ciwan dihêle. Yê kevin red nake, yê nû, wek hevî li ser bingeha kevin û di ronahiyê rojê de, bi agirê aştiyê ava dike.

Mohra huriyan jî her du aliyan ve dide xuya kirin; aliyek desthilatdarî ye, klasik e, aliyek nûjenî ye ciwanî û guhertin e... Xweşik e, bejin zirav e, delal e, çav reş birh kevane, mijgul tî re, newqê kivroşk e. Kirasê çar berî ye, bi erdê re dixiriqê, xef-tanê hevrişim li ser e. Bîsk û berbîskên wê bi ziv û zêr xemilandî ne, çil keziyên we bi tayên zêr û ziv hunandî ne, taca wê

Ciwanê Salê de ji xuya dike. Dema ku Kalê Salê û Ciwanê Salê diçin hev bi efra, Bûka Salê -Jiyana Ciwanîk, dibêje; "Sal çû dem hat / Nobetguhêra demê hat / Guhê xwe bidin ser-demê" (bi devê mambêja jin).

Di vê kêlikê de Qirdik xwe diavêjê holê... Qet pêça xwe nadê efra Kalê Salê û Ciwanê Salê, di kêleka Bûka Salê-Jiyana Ciwanîk de radiweste, pêşî li koma pey xwe dinêre, berê xwe didê civatê, dibêje: "Kê kê li erdê da / Bûka sale ya wî ye", piştê bangî Kebaniya Malê dike.

Gotinên destpêkê, yanî ketina hundir dubare dike;

Serê Salê Binê Salê

Xwedê kurekî bide kebanîya malê

Zarok birçî ne li male

Kebaniyê delalê behra Qirdik

Helil û mewijan derîne ji kûwarê

Tê bibîne cejna Newrozê a 21"ê Adarê

Di pirozkirina sersala Kurdan de, di gera zarok û listika teatroyî de, di axaftin û daxwaza ji Kebaniya Male, du rastî hene; Bawerî û rastî... Kevin û nû!... Kalê Salê berxwe dide, Bûka Salê-Jiyana Ciwanîk dixwaze... Ev rastiya Kalê Salê ye û statuko diparêze. Rastiya Ciwanê Salê jî heye, namzêdê sala nû ye, jiyaneke ciwanîk li pêşîya wî ye û gava yekemîn ji avêtîye. Jiyana Ciwanîk-Bûka Salê, bi dev Kalê Salê re bernade û her du êrişî hev dikin. Şerê efra jî şerê navbera gel û desthilatdaran e...

Ehmedê Xanî di Mem û Zîn de dibêje;

Keçan bakirê xortên nûgihîştî û hemî sersalî

Ji ciwanan heta bigijê pîr û kalêsn sedsalî

Vêca; dema ku min behsa nîrxandîna Hisyenê Feho girte dest, mijada Memû Zînê ku li ser bingeha cejna Newrozê hatiye avakirin e. Mem digel Tacdîn, Zînê jî digel Sîtiyê diçine cejna Newroz û li wir hev dibînin. Hevdiytina dibe evînek destanî. Destana gelê Memê Alan li wir hatiye nivîsandin. Ehmedê Xanî jî ji wir derketiye rê û Mem û Zîn nivîsî ye.

Lê berî van teva dema ku koma zarokan li derî dixin, bêyî ku wan bifermojî hundir bikin, koma zarokan bibez dik-evine hundir. Civak rûniştîye, sifra wan di rengê "Heft Sînî" de, kişûmat şîrniya zivistanî li ber mêvanan e. Zebeşekî mezin jî li nivê odê ye. Ew Zebeş saet di 12.00'an de, nivê şevê tê şikandin. Gelek çaran civat, berî koma zarokan biçin mala wan, amadekariya ku teatroyekê bi wan bidin listin, Kalê Salê û Ciwanê Salê bi efra berbidin hev planan dikin. Di planê wan de rola sereke jî ya Kebaniya Malê ye. Ji ber ku koma zarokan ne civatê, Kebaniya Malê muxataba digire, her û her bangî wê dikin. Ev toreyek kevin e û hina jî demsalên dayiksalari maye. Ji ber qutê male di destên kebanîyan de ye. Hina li devê derî, dema piyên xwe diavêjin aliye din yê pipinka hundir, bi hev re -koro- dibêjin:

Serê sale binê sale

Xwedê kurekî bide kebanîya malê

Heçî (eger) nedê mar pêvedê

Kebaniyê ser zêrinê

Destê xwe biavêje kûlinê

Behra qirdik (û hevalên) wî zû derîne

Civat zimandirêjyan dike û bi armanca Kale Salê û Ciwanê Salê berdin hev, dest bi kelmemaniyan dikin, gotinên kelejavî dikin û nav di herduwan didin. Pîrnanî Kalê Salê sor dikin. Minak, dibêjin "Bûka Salê ya te ye, Ciwanê Salê çav berdayê, wê jî te bistine, tê çawa qebûl bike?" Bi vî rengî û gotinên cûda navbera her du aliyan sor dikin.

Zarok ji van kelmemanan baş dizanin, armanca wan ji fêmdikin. Ew ji ji bo vê listika teatro amade ne. Armanca wan dan-heva qutê zêde ye.

Berî ku Kalê Salê û Civanê Sale werin pêşberî hev, Qirdik xwe diavêje hole;

*Dem û dem qîskê bi qedem
Xwe gihande sere salê
Kebaniya Malê-Civata malê-
Qirdik ji bo sersalê hate malê
Xwedî kûrekî bide kebanîya male
(Xwedê kurekî bide ciwamêrên li male)*

Ev gotinên Qirdik daxwazê zêde dike, hinek ji kesên di civatê de peran ji didin.

Kalê Salê dest bi gotinan dike; bi devê Hozan Mehmedê Hezexî:

*Emrê çuyî navegerê
Emrê mayî wê ber bi xweşî here*

Ciwanê salê van gotinan dibêje û ber bi Bûka Salê diçe. Bûka Salê nazê dike, gavekê bere paş diçe. Kalê Salê gavekê ber bi Ciwanê Salê diavêje;

*Kalê Salê bûriye
Riya wî wek pembûyê spî ye
Lepikên di destên wî de
Ji Hevrîşmê badayî ye
Hewramî li nava mîlê wî ye
Gûlika kolos sor û spî ye*

Kalê Salê hers dibê ber bi Ciwan diçe dibêje;

*Demûdewran e, agir agirê kalan e
Tecruba kalo bi salan e*

Ciwanê Salê û Kalê Salê destên xwe diavêjin newqa hev û dest bi efrî dikin. Hinekî kêferatê dikin, şerê xwe dirêj dikin û kêfa civatê tinin. Di encamê de Ciwanê Salê kal didê erdê.

Kalê Salê hina li erdê dibêje;

*Ev ne bûka evînê ye
Ev bûka jiyana gelan e
Ev nişana sersala Kurdan e.*

Ciwan radihêjê destê Kalê Salê radike, dibêje:

Kalo ma tu nizane xelasiya gelan bi ciwana ye

Ciwanê Salê rûdinê qelûnê pêdixe û duxanê bi ser serê xwe dixê. Bûka Salê ji diçe kêleka Ciwanê Salê.
Kalê Salê berê xwe didê Kebaniya Malê;

*Serê salê binê salê
Xwedê kurekî bide Kebaniya Male
(çar carab dubare dike)*

Bi devê Hozan Mehmed Hezexî;

*Ez hej ji te dikim bêhtir ji berê
Emrê çuyî na vegeerê
Wa çavreşê kezî zerê
Emrê mayî wê ber bi xweşî here.*

Qirdik di wê kêlikê de çemê xwe li erdê dide;

*Teq teq bi req req
Tore heye heq bi heq
Kebaniya Malê me ji bibine
Weke her sal bide heq*

*Ev kebanîya malê ye
Qutê malê bi destê wê ye
Qirdik Qasidê sersala Kurda ye*

Kebaniya Malê ji tevli teatro dibe;

-Ev çi bela ye

Qirdik hers dibê;

*Kebaniyê ser zêrinê
Destê xwe biavêje kûlinê
Behra qirdik zû derinê*

Dema ku Kebaniya Malê milên xwe bihejine, xwe giran bike, bikene û metroziyên xwe bike.

Qirdik dibêje;

*Kebaniyê delalê
Behra Qirdik helil û mewîjan ji kûwarê derine
Zarok li malê birçî ne
Tê bibîne gelek cejna Newrozê a 21'ê Adarê*

Kebaniya malê car din gotina "bela" bikar tîne û listikê dirêj dike;

-Ev çi bela ye, me got nine, ew di lorîne

Qirdik dibêje:

*Ev kebanîya malê ye
Qutê male bi destê wê ye
Qirdik qasidê sersala Kurda ye*

Kebaniya Malê bi dilekî xweş;

-Ez qiyemt bi Qirdikê sale didim
Ew ne qirdik e, qendê (zanist) Kurda ye

Bi van gotinan re, Kebaniya Malê para qirdik û tevahiya zarokên pê re dide. Zarok û qirdik bi yek dengî dibêjin:

*Serê dik-i bi kulav e
Binê dik bi kûlav e
Xwedê kûrê malê zu bike zava*

Bi devê Hozan Mehmed Hezexî, koro dibêje:

*Ez hej ji te dikim bêhtir ji berê
Emrê çuyî navegerê
Wa çavreşê kezî zerê
Emrê mayî wê ber bi xweşî herê*

Tiştê ku zarok kom dikin, li malekê, car caran li gastinekê- qelaçekî ew bi xwe tifikê çêdikin agir pêdixin û xwarina xwe çêdikin, bi hev re dixun. Govendê girêdidin dilîzin, heta sibehî şahiya wan didome.

Ji bilî şeva sersalê roja nû ya salê Kurd li mal ranawestin. Keç, xort kal, jin û mîr teva cil û bergên herî delal û rengin li xwe dikin û diçine nava şinayî, bax û baxçeyan, diçine seyranê, li deşt û mîrgan çîya û gastinan Newrozê, sala nû pîroz dikin. Agir didadin, zarok û xort û keç xwe di ser agir re diqevêzin. Agir lewnekî paqijkirina ji gunehan, ji qirêjê ye. Govendan girêdidin, dilanê dilîzin û listikên çûrayî yên keç û xortan dilîzin. Ehemdê Xani vê toreyê wek "toreya pîroz" binav dike.

Dibêje;

*Dewra felekê, ji bextê vekirî û zelal û pîroz
Disa ku nişan da ji nû ve Newroz*





Şîrê xavê dayîkên me...

Dema rojên wek serê salê û cejnê tîn, di sohbetan de gotinên wek “di çaxa zaroktiya me de, me wiha dikir” an jî “wexta em li gund bûn, me li serê salê wiha dikir, beriya cejnê wiha dikir” ji nişka ve ji zimanê miroj dirije. Her kes di bîra wî de çî maye, bi heyecanekê wan bîranînên xwe dubare dike. Rojên ku bahsa wan tê kirin, rojên dem û demsalên çaxên berê ne. Çîrokên demên berê ne û ew êdî nema tîn jiyîn. Ketine ber awa cemê rastiya me ya civakî û berav berav çûne. Em jî di her firsendî de bi bahskirina wan, bi jî nû ve vegotina wan dilê xwe hênîk dikin û bo çend deqîqeyan be jî, jî bandora kaos û stresa jiyana îroyîn xwe dîr dixin. Helbet piranî caran bi dilopên ku bi dizî jî çavên me difûrin re...

Piraniya wan hestên jidil, pak, nerm, sivik, dilovan, xwezayî, civakî û evîni yên ku jî dema jiyana me ya li gundan di bîra me de mane ne. Kaniyên ku me av jê vedixwar, darên ku me di bin siyê de bêhna xwe distand, çemên ku me tê de avjênî dikir, tîrbên ku me beriya cejnan ziyaret dikir, şin, dîlan, cejn, pîrozbahî û dawetên ku me hestên xwe

dixist nava yên hevdu û girî û kenê ku me bi hev re dikir...

Kurd, xelkekî ku bi derengî bajarî bûne ne. Bona vê yekê jî bîranînên jiyana li gundan a xwezayî kêm be jî hên hinek zindî ne. Tevî vê yekê, li hinek deverên Kurdistanê jiyaneke xwezayî ya bi van nirxan xemilî jî hîn tê jiyîn. Bi taybetî li herêmên Kurdistanê yên çiyayî, yên jî bajar û bandora sazîyên dewletan dîr, jiyana Kurdewarî ye.

Belkî em jî xwe, jî rastiya xwe ya Kurdewarî qut bûne; lê mirov nikare bêje ku Kurdewarî jî ji kokên xwe qut bûye û tenê di rûpelên dîrokê de wek çîrokên hatine jîbîrkirin, maye. Ew kanî hên zuwa ne-bûye, deng û rengên Kurdewarî li ser pê ne. Belkî hinek çilmisî ne, lê zindî ne. Rast e; jî ber êrişên desthilatdaran, bi bandora nirxên modernîzma biyanîyan û nexwedîderketina me Kurdan hinek xesar dîtîye. Eger em lê xwedî derkevin, ew çînara Kurdewariyê wê disa hêşin bibe; jî bo jiyaneke xwezayî, watedar, rengîn û dengîn...

Rastiya me û şîrê xav

Çend roj berê bi hevaleke rojnamevan re me behsa

bandora bajarîbûnê ya li ser hiş û helwestên civakî dikir. Hevala Gelawêj ji Rohhilatê Kurdistanê ye. Min jê re got, “Ez bajarî bû me û bandora jiyana bajarî li ser min zêde ye.” Li ser vê gotinê, wê jî got, “Min jî ewqas di dibistanên Îranê de xwendîye û ez jî di bin bandora nirxên bajarê de me.” Dema me bahsa bajarîbûnê dikir, bi vê gotinê me xwest dîrketina xwe ya jî hest û helwestên Kurdewariyê binin zimên.

Ji ber ku jiyana bajarê bi rastiya me ya civakî nehatiye sazîkirin. Jiyaneke jî bo xizmeta aqilekî serdest hatiye sazîkirin e û ne xwezayî ye. Îro em li bajaran, di nava çemberê jiyaneke ku bi her tiştî xwe gori berjewendîya serdestan e, bi nirxên nû, bi tîkîliyên nû, bi rengên nû û bi hest û helwestên nû, lê bê vîn û bi mecbûrî him xwe him jî nirxên xwe yên xwezayî û civakî di destarê modernîzma kapitalîst de diherînin, tune dikin...

Di jiyana bajarî ya modern de herkes her tiştî tenê jî bo xwe dixwazin, jî bo xwe dixebitin, jî bo xwe dikin. Her tîkîlî bi mentalîteya pêşbazîyê pêk tê û jî hêla otorîteyê serdest ve tê mecbûrîkirin. Hest û helwestên me ne xwezayî ne. Gorî rastiya xwe; em bi xwe, êdî ne em in! →



Xelîl DALKILIÇ

Bawermendê kîjan baweriyê be bera bibe; di hêla baweriyê de jî reseniya Kurdî ne şiklî ye, berovajî jidil e. Bi taybetî li gundan, têkiliyên Kurdên Misilman û yên Yaresan ên di bin rejîma Îranê ya Şîî û têkiliyên Kurdên Elewî yên Mereşî û Dêrsimî yên di bin rejîma Tirkiyê ya nijadperest û Îslamîst û têkiliyên Kurdên Êzîdî, mîna hevdu ne.

Hest, reng û bêhna rastiya me tenê di çirokên biraninan de maye. Di sohbetê de hevala min Gelawêjê got, "Însan e, şîrê xav vexwariye!" Erê, însan e, şîrê xav vexwariye. Belkî maneyeke neyînî li vê gotinê hatiye barkirin. Wekî bi maneya, însan dibe ku şaştiyan bike, bê bikaranin.

Lê mirov dikane ve gotinê bi wateyêke din jî binirxîne. "Xav"; yanî orjîn, resen, pê nehatiye şuxulîn, saf, wek şîrê dayikê, ava jiyânê ya ku em hest û helwestên xwe yên mirovî û civakî jê digirin. Bi şîrê xav ê dayikê xwe em tîrî rastiya xwe ya mirovî û civakî jî bûne.

Li gundê me kaniyêke biçûk hebû, me jêre digot "kaniya reş". Tevahiya biranînê min ên zaroktiyê li derdora wê kaniyê digerin. Lê, tê gotin ku ew niha zuwa bûye! Wer li min tê, wekî ku tu tişt jî rastiya civakî ya ku ez tê de mezin bûme, yanî ez pê bûme ez, maye...

Ji ber vê yekê; ne ji şîrê xav ê dayikan, Lê divê mirov jî şîrê kelandî yê ku serdestên bajarî bi me didin vexwarin, bitirse. Ji wî şîrê ku wek jahrekî me felç dike, me ji me dîr dixê, me bi me dide jibîr kirin. Bi wî şîrê ku me ji destê serdestên modern vexwarî, me hiş û hesten xwe wenda kirine, em belavela bûne, ji xwe û jî rastiya xwe qut bûne. Em êdî ne kesayêtên civaka xwe ya xwezayî û rasteqîn in; li şûna wê, karker, karmend, endazyar, mamoste, burokrat, nivîskar û xizmetkarên patronan, ên şirketan, an jî yên dewletan in...

Zindî û mirî wekhev in...

Ka werin em çavê xwe vegehin rastiya Kurdewarî; ji ber ku wek nixên mirovî, civakî, moralî pêwîstiya me bi çî hebe, di wir de heye. Gorî vegotina hevala Deniz; li gundê herêma Dêrsimî bo pêşwazîkirina serê salê kevneşopê Gaxanê tê berdewamkirin. Bawer dikim, bi heman awayî nebe jî, li seranserê Kurdistanê kevneşopên bi vî rengî tene domandin. Ciwanên gund kincên cûda cûda li xwe dikin. Herkes bi xwarinên ku ji her malê

hatine berhevkirin, li mala kesê herî feqîr ê gund kom dibin; wan xwarinan parî hev dikin û bi hev re dixwin. Paşê heta serê sibehê muhebetê dikin, çirokan vedibêjin, stran û kilaman distrên...

Di rîtûelên di rojên gorî demsalê û rengguhertina xwezayê her sal tîrî dubarekirin de tu zindî û tu mirî jî nayên jibîrkirin. Para herkesê tîrî veqetandin. Di rîtûelên bo pêşwazîkirina serê salê de bo miriyan xwarina "Xêrê Merdû" yanî "Xêra Miriyan" tîrî amadekirin. Hinek ard û rûn tîrî tevlihev kirin û paşê tîrî avêtin nava agir. Tê bawerkirin ku bêhna şewata wî hevîrê ku bi ard û rûnê hat çêkirin, wê ruhê miriyan tîrî bike. Ne tenê di serê salê de li beriya rojê her cejnê jî herwiha tîrî tîrî ziyaretkirin û mirî tîrî bibîranin, bona xêra wan şîrînahî an tiştên xwarinê yên mîna kakilî û şekir tîrî belavkirin.

Di kevneşopên jî tîrî tîrî xwezayî pêk hatine û hên jî tîrî domandin de tu zindiyên li xwezayê jî nayên jibîrkirin. Hinek jî xwarinên ku di malan de tîrî amadekirin li derdora xênî, li hewşê û li xwezayê tîrî reşandin. Ev para kurm, mîş, mîşk, mar, çûçik û hwd a tevahiya zindiyên li xwezayê ye.

Herwiha her sal ber bi payizê ve, wexta tiştên hatine çandin jî zeviyan, jî baxan tîrî berhev kirin; dîsa tu kes, tu zindî nayên jî bîr kirin. Ji tiştên xwarinê yên hatinê çinin hinek li xwezayê tîrî hiştin ku zindiyên derdorê jê bêpar nemînin. Herwiha beriya her tiştî para kesên feqîr û xizan ên gund jî tîrî veqetandin.

Yanî her tişt bo her kesî ye, bo her zindiyê; bo însan, ajal û sewal, dar, av, zindî, miriyan e... Dî civakeke wisa de her tişt tîrî parvekirin de tu kes birçî namîne, tu kes birçî nayê hiştin...

Sifte homete ra (siftê jî xelkê re)

Kurd di jiyana Kurdewarî ya rasteqîn û xwezayî de di dua û dirozên xwe yên jî Xwedê an jî jî Xizir re dikin de, despêkê jî bo xelkê, jî bo

kesên din daxwazê dikin û paşê bona xwe dikin. Destpêkê xelkê tîrî dikin, paşê xwe. Destpêkê xelkê dîlşa dikin, paşê xwe... Kurdên Elewî wiha bang li Xizir dikin: "Ya Xizirê kal / deriyê şer bigire, deriyê xêrê veke / Ocaxê tu kesî kor meke / Dêrdê bê derman mede tu kesî / Miradê tu kesî di çavan de mehêle..." Bi Kirmanckî (Zazakî) jî wiha bang li Xizir tîrî kirin: "Ya wayîrê hard û asmenî / Neçar û xerîb meverde nî feqîrî / Ya Xizir sifte hometê ra / Pey ra ke ma re biye comerdiye..."

Bawermendê kîjan baweriyê be bera bibe; di hêla baweriyê de jî reseniya Kurdî ne şiklî ye, berovajî jidil e. Bi taybetî li gundan, tîrî tîrî Kurdên Misilman û yên Yaresan ên di bin rejîma Îranê ya Şîî û tîrî tîrî Kurdên Elewî yên Mereşî û Dêrsimî yên di bin rejîma Tirkiyê ya nijadperest û Îslamîst û tîrî tîrî Kurdên Êzîdî, mîna hevdu ne. Di tîrî tîrî civakî de nixên piştgiriyê, parîhev kirinê, yên jidil û ne şiklî derdikevin pêş. Feraseta jiyana xwezayî ya li çiya, gund, çol û beyaran aştiyane ye, gorî pêwîstiyên civakî ye, jidil, ne şiklî û bi giştî xwezayî ye. Mixabin îro em jî van nirxan, jî van hestan, jî wê dilpakiyê dîr ketine...

Em rêwiyan rastiya xwe ne...

Lê niha em Kurd ketine dîr rastiya xwe. Azadiya xwe ne di pergalên biyanî, modern û serdestiyê de, berovajî di rastiya xwe ya civakî de digerin. Bo wekhevî û edaletê jî nû ve berê xwe didin rastî û xwezaya xwe. Ew rastiya me ya ku hevîrê wê bi şîrê dayikê me yê xav hatiye histîrandin. Hêvî zindî ye; jiber ku em hên jî bi biranînên xwe yên çaxên berê, yên çaxên ku em hên bi rastiya xwe dijîn, moralî dibin. Îro li ser her çiya û li kolanên her çar parçeyên welat, jî Kobanê, Şengal, Kerkûkê heta Zindana Ürmîyê Kurd bi yek dengî awazên senfoniya Kurdewariyê diqirin. Em rêwiyan rastiya xwe ne û bona vê yekê jî divê em qe jî çirokên xwe qut nebin...

Di tîrî tîrî civakî de nixên piştgiriyê, parîhev kirinê, yên jidil û şiklî dernakevin pêş. Feraseta jiyana xwezayî ya li çiya, gund, çol û beyaran aştiyane ye, gorî pêwîstiyên civakî ye, jidil, ne şiklî û bi giştî xwezayî ye. Mixabin îro em jî van nirxan, jî van hestan, jî wê dilpakiyê dîr ketine...




Awaza bi cesaret a jinê Banû Şîrwanî

Jin bi giştî bi rêya ol û qanûnên sistema mîrsalarî û feodalizmê tim rastî zextan hatine. Lê kesî nekariye deng û awazên wan bifetisîne. Qêrîn û nalînên wan hezar peyam tede ne. Hawar û gaziyên wan wisa tije şewat û eşên giran in ku kes nikare bi bihîstina dengê wan venecîniqe.

Yek ji wan jinên bi awazên xwe bûye qîrîna jinan û cesaret daye wan ji Banû Şîrwanî ye. Banû Şîrwanî, piştî Nene Qemeronî jina duyemîn e ku di nava Kurdên Xorasanê de wek stranbêj bi nav û deng in. Lê Nene Qemeronî hê ji keseke bênav û nîşane û tenê di biranîn û hevpeyvînan kesên mîna Sîma Bîna de navê wê tê bihîstin. Banû Şîrwanî ji Kurdên Qoçanê û serbihûriya wê dişibe a Merem Xan, Nesrîn Şêrwan û Eyşe Şanê. Wê ji zaroktiyê bi rêya bavê xwe dest bi strangotinê kiribû. Ew heza ji hunerê mîna şîtila rihaneke di dil û hisên wê de şin û zindî ma û heta roja mirinê jî rengê xwe negûherî.

Navê yê rast Mahbanû Ebbasî ye. Sala 1929'an û li gor hinek jêderan jî di sala 1926'an de li gundê Welîava ê girêdayî Farûc û Qoçanê hatiye dinê. Temenê wê 40 salî bû ku li radyoya Meşhed dest bi strangotinê kir. Bavê wê Ebasqolî, dengbêjekî naskirî yê herêma bû. Hê zarok bû ku dayika xwe jiyana xwe ji dest da û ev jî bû sedem ku pir caran bavê wê yê hunerhez di diwana herêma de Mehbanû jî bixwe re bibe. Melek Husênxan yek ji wan kesan bû ku heza wî ji huner û çanda Kurdî re bêsinor bû. Enstûrmenta Dutar lédixist û li gundê Welîava hunermend û pehlwanên Kurd dianîn ba hev û hurmeta wan tim li ber çav digirt.

Wê di dema xwe de li Xorasanê nûneriya dengbêjî û hunermendiya jinên Kurd kiriye. Heta di nava gelê serdestan ku Farisan de jî jin xwedî wê hêz û cesaretê nebûn ku dengê xwe belavî nava gel bikin. Dengê wê yê çiyayî zû ket nava dilê xelkê. Hingî navdariya wê wek stêrkekê geş bû ku dengê wê li her derê dihate bihîstin.



Kakşar OREMAR

Li hemberî zehmetî û qedexeyan têkoşîya

Mamostayê dîrokan û evîndarê ziman û çanda Kurdî rêzdar Kelîmulah Tohidî hevpeyînek bi Banû Şîrwanî re çêkiriye û li wir ew wiha behsa jiyana xwe dîke:

Hê 20 salî bûm ku ez li şivanekî Kurd yê binavê Eli Ekber Qehrremanlo mehr kirim. Du sal piştê ew bi nexweşiya zerikê mir û ez bi kurê me yê du mehî re bi tenê mam.

Salek piştê ku dilgirtî bûm min 15 ser pez,

çêlekek û guhdîrê xwe firotin û ji gund derketim. Min nedikarî li gund strana bibêjim. Xelkê jî ber wê ku min


stran gotine henekên xwe bi min dikirin û digotin: "Hê salek ji mirina mêrê wê re derbas nebûye ku dîsa distrê."

Ji ber wê min gundê Welîava terikand. Çûme nava reşmalên tiyê xwe û xizmên wî ku li çiyayên bakurê Qoçanê bûn. Min xwest li wira him barê xem û elemên xwe sivik bikim û him jî ger min karî, bi wî diravî careke din çend pezan bikirim û jiyana xwe berdewam bikim daku kurê min mezin bibe. Lê wan hevkarîya min nekirin. Ji min re digotin: "Piyê te yê xêrê nebûye û hatina te bû sedem ku mêrê te wiha zû bimire".

Ev rewş bû sedem ku şevêkê di tarîtiyê de û bi pêlavên diryayî ku di piyê min de bûn, min reşmalên wan terikandin. Kurê min li piştê min û ez bi çavên tije hêşir jî çiyayên Elî Bûlax ber bi Qoçanê ve birêketim. Ez bi piyên bi birîn, werimî, peçiyayî û westiyayî jî wan çiya, gelîyên dirêj û tije kevîr derbas û ketim nava Qoçanê. Çûme kerwanerayekê ku li şeqama "Şehirê Kohnê" bû û di odayekê de vehesim. Rojên piştê ketim pey peydakirina kar û ev di rewşekê de bû ku jî ber germa û têhnîtiya rêyê de kurê min bi giranî nexweş bû.

Çûme cem bijjkekî ku kurê min derman bike. Min berê ew dinasî û çend cara hatibû cem me li Welîava û bibû mêvanê Melik Husênxan û nexweşên wan derman dikirin. Wî jî min nas kir, êşa kurê min derman kir. Ez bixwe re birim malê. Salekê li mala wî xebitim û piştê karê wî dan Meşehdê û ez jî bi malbata wî re hatim wira. Kurê min hêdî-hêdî mezin dibû û min dit ku di mala wan de hinek zehmetiyan derdixe. Ji ber wê jî ez ji mala wan derketim.

Wan rojan jinên Kurd bi kincên Kurdî û bedewên xwe li her dera bajarê Meşhed dihatin dîtin. Ji ber wê jî berevajî roja iro hingî kes jî dîtina kincên min yê rengîn û Kurdî ecêbgirtî nedima û kincên Kurdî tenê kincên naskirî ên netewî û resmî yê Kurdên Xorasanê bûn. Bi van kincên rengîn û bedew re ez di nava cade û şeqaman de sergerdan û aware jî xwe re digeriyan û min jî xwedê daxwaz dikir ku rêyeke çareseriyê jî min re peyda bike. Rojêkê tehnî bûm û çûm ku avê vexûm. Ji nişka ve min dit jî aliye dîn yê cadê xanimê ber bi min ve tê. Wê jî rûyê min yê xemgîn ku zarokê li piştê min girêdayî û tenê dimeşim zanibû ka xema nava dilê min çiya. Piştê min zanî ku ew Izzet Meqdem, xanima rêzdar Şobirî berpirsê îdareya perwerdê bû ku tabloyê wê li wira daleqandibûn û jî ber ku ez nexwende bûm, min nedizanî ku ez li nêzî wanim. Wê ez birim çihê perwerdê (darûlterbiye). Navê kurê min li wê dibistanê nivîsandin û ez jî wek karker birim mala xwe. →



Wêneyek ji herêma Qoçanê a ku Banû Şîrwanî lê hatiye dinê.

Bi daxwaz û cesareta xwe pêş ket

Hingî radyoya Kurdî a Xorasanê bernamêyên xwe belav dikirin (sala 1956'an yekemîn bernamêya Kirmancî ji radyoyê hate weşandin). Rêzdar Şobirî li malê radyo hebû û min ji hemû şevê bernamêyên şad û xweş yê muzîka Kirmancî guhdar dikirin. Rojên xweş yê Welîava di nava riha min ya xemgîn de careke din can digirtin û ez dibirim nava fikran, ka çawa xwe bigihînim idareya radyoyê.

Rojekê ji bo kirîna goşt û pincar çûbûme bazarê, bê îrade çûme stasyona radyoyê ku her şevê adrese wira dihate îlan-kirin. Dergevanê deriyê îdarê li ber min sekîni û got: "Çi karê te heye? Min got: "Ez hatime awazan bêjim. Dergevan ecêbmayî ma û got: "Ma jin ji dikarin stranên bêjin? Heya niha ti jinek nehateye ku awaza bêje! Bîsekine daku ez bipirsim û bersivê bideme we..."

Hingî berpîrsê radyoyê rêzdar Emîr Mucahid bû. Wî û karmendên wira bi dîtina min ecêbgirtî man. Çimkî ez yekemîn jin li Xorasanê bûm ku ji bo tomarkirina awazên xwe çûbûme radyoyê. Ew ji jineke Kurd a Qoçani bi kincên Kirmancî ku Farsi jî nedizani.

Wan gotin emê dengê te biceribînin û min xistin odeya tomarkirina deng. Hissên min germ û bilind bibûn û li ser biranîna welatê xwe Welîava min def girte destê xwe û ji kûrahiya dilê xwe min strana "lorik" got ku his ji serê wan çû. Dema karê min hat dawiyê, wan teva hêrişî odayê kirin û gotin: "Her bijî, pîroz e, pîroz e. Min got: "Bes! Niha ku we pe-jirand, tomar bikin..."

Wan gotin: "Me hemû tomar kir û ji vê ji baştir nabe. Îşev guhdarî dengê xwe bike ku yê ji radyoyê bê belav kirin. Te Kurd ji nû ve sax kirin. Kurd li cihê xwe, te Xorasan ser-bilind kir..."

Hêza stranê û dengbêjiya jinê

Çiroka jiyana Banû dîr û dirêje. Lê wê sedan stranên din

ji di arşîva radyoya Meşhedê de tomar kirin. Roj bi roj guhdarên wê zêde dibûn. Name li pey hev dihatin ku stranên wê zêdetir biweşînin. Di sala 1969'an de dest bi strangotîne kir, lê dengê wê yê çiyayî zû ket nava dilê xelkê. Hingî navdariya wê wek stêrkekê geş bû ku dengê wê li her derê di-hate bihistin. Stranên weke: "Yar me nezanîbû, kes me naxwazê, ezê iro êxîrim, keçik naz meke û hwd" bi navê wê ketin ser zarê xelkê.

Li pey hatina rejîma Îslamî strîna jinan qedexe bû û Banû Şîrwanî ji ji tîrsa îdamê xwe wenda dike. Piştê hemû wisa dizanin ku ew miriye. Salên piştê hate zanîn ku ew sax e.

Banû Şîrwanî weke qehremana qada stran û awazên Kirmancî li her derê dihate naskirin û hezkirin. Her kesî mafê wê bînpê dikir, lê ew li ser piyê xwe sekîni û bû navdareke dîrokê. Banû sala 2003'an li Meşhedê çû rêmetê.

Banû Şîrwanî di nava Kurdên Xorasanê de navekî naskirî ye. Wê di serdemekê de nûnertiya dengbêjî û hunermendiya jinên Kurd li herêma xwe kirîye ku heta di nava gelê serdest an ku Farsan de ji jin xwedî wê hêz û cesaretê nebûn ku li ser eşîq, qedêr û aliyên din yê jiyana civakî dengê xwe tomar û belavî nava gel bikin. Ew wek kewek çiyayê bilind xweş distir. Wê û dengbêjên din karîna bi rêya kilamên xwe eş elemên dirêjahiya dîroka xwe a tije rabûn û ketin beyan bikin. Wan li ser xêzeke sor ji Ūrmiyê û kela Dim-Dim, ji Makû û Serhedê bigire heya digehe Qoçan, Şîrwan, Bicnûrd û barkurê Xorasanê tevdigeriyan. Koçberiya ku xêza wê bi xwînê hatibû reşandin, ew neçar kirin ku welatê xwe biterikînin.

Arşîva dilê Banû Şîrwanî dewlemend bû

Banû Şîrwanî di karê xwe de hosta û şehreza bû. Arşîva di dilê wê de pir dewlemend bû. Wê di demeke kin de gelek stran û awazên bin axê, jengargirtî û ji birbûyî bi muzîkê esil û Kurdî yek bi yek tomar û ji mirinê rizgar kirin. Piştê kesên din ji hatin û wan bi hev re ew gencine

ji qoncîk û tarîtiya mal û gundên Kurdan derxistin û hemû kirin malê dîrokê. Mirasê ku dihat bimire bi ked û hewl-danên wan ji nû ve bû mirasêkî bêmirin.

Banû Şîrwanî, bi cesaret û dengê xwe rê li ber hinek jinên Fars ji vekir ku li deriyê gencine û xizîneya folklor û stranên Kurdî bidin. Hunermenda navdar a Îranî Sîma Bîna ku xizmeteke mezin ji folklorê Îranê û Kurmancên Xorasanê re kiriye, ji bo Banû Şîrwanî wiha dibêje: "Qerî-nên pir siruştî, çiyayî û tije hissên protestoyî... Weke ku îtirazê li dîroka xwe bikin, qerîn û hawar di muzîka wan de hebûn. Wek tê gotin ew ji wan Kurdan in yê ku ji herêmên sînorî yê Rojavayê Îranê bo wira hatibûne koçber kirin û ew ji tim di xûrbetê de mane, lê bi rêya muzîka xwe, ew îtiraz, şervanî, hemase û şerên herêmi ku hebûne, anîne ziman. Elbete di wan awazan de mijar li ser standina heq û mafên wan yê netewî ne ku hebûna wan bîparêzin... Bi wan qerînan re min di wan kilam û stranên de derdekî hevpar his dikir."

Wêjeke dewlemend a devkî

Di kilamên Banû Şîrwanî de em rastî wejeya devkî û bihêz a Kurdên Xorasanê ji tî. Peyv û gotinên weke: "Gulnazîkê xwe, lorikê xwe, lê yarê" bi hezar hez û xweziyan behsa keçên Kurd dike ku li pey şer û talanan li bazaran hatine firotin. "Ez aşîjim eman yarê" li ser der bi deriya keçekê distire ku azadiya wê berband û li ser derdê cudatîyê dibêje.

"Gulperî û dest bi hena", evîna bêsînor ya du evîndaran ji hev re, "Leylî û Leylanê" û dehan stranên din vê rastîyê ji me re eşkere dikin ku nemir Banû Şîrwanî xanimeke zana û haya wê ji rewşa gel û civakê hebûye. Bi bihistina dengê wê carna jiyana gundiyan, carna çiroka du evîndaran, carna talan, qirkirin, carna ji çûl, deşt û çiya, çîmenzar, sêv, hinar û rengê jiyana Kurdan a tije xweşî, nexweşî û xembarî tê ber çavan.

Li herêma Hewremanê şahiyek.



Mêjûyê Bêsi

► Abdullah DEMİR*

Carnan miroveke dibe gelekî û carnan jî gelekî dibe mirovek. Carnan êş, jan, hêrs, keser, pêşeroj û paşeroja gelekî, di mirovekî de kom dibe û carnan jî ya mirovek li gelekî belav dibe. Mîna îro ev bi dijwari hiskir û tégihîştim. Piştî ezayê du saetan, serleşker kelemçeya min vekir û ez ketim hundirê eywana dadgehê. Ev ne cara ewil bû ku ez dihatim vir. Eywana dadgehê biçûk bû. Ji caxek û amûra mirov bi astengi dikaribûn biliviyana. Ez li nava caxan, li ser piyan rawestiyam. Li pêş min katib û hema li pişt wê jî dadger bi komputerê paşiya xwe re mijûl dibûn. Her du ji jin bûn, lê nivîsyar ciwantiir bû.

Min di vê navbera kurt de li dora xwe nêrî. Mubaşirê sereke tunebûn. Di şûna wî de mirovekî ciwantiir li wan xwaran diliviyam. Du leşker li her du milên min rawestiyabûn. Serleşker jî li paşiya eywanê xwe avetî ser rûniştgehê.

Dengê listika zarokan û erebeyan ku diçûn û dihatin, hema bala min bi wir de kişandin. Seranserê diwarê eywanê yê aliye derve bi giştî pace bûn. Pace welê nizm bûn ku, mirov weke li derve be. Welê jî ronî bûn. Min jî ciyê xwe her liv û lebata jiyana ku li derva diherikî, bi mereqa salan temaşe dikir. Kolanek navbera taxê û li rex rê jî du avahiyan pirqatî bilind dibûn hebûn. Darên baçxeyan hêj rûp û rût bûn. Tazibûna daran xemginiyê xerib bi mirov didan hiskirin. Lê vê rewşê ez jî balkirî nê dîrnexistim.

Bi pirsra dadgerê re min çavên xwe jî dimenên şibake zivrand. Welê ku min pir da dubarekirin. Heman pirsên berê jî min dikirin. Min ew bersivandin:

- Min berê jixwe gotibû, ezê parêzer negirim. Ya duyemin, ji ber ku li nezaretê kelemçeya me nayê vekirin û mafê min yê parastina bi Kurdî jî min hatiye standin, ez parastinê nakim.

Dadger, tiştên ku min gotin, da nivîsandin:
-Bersûcî naxwaze parastinê bike û mafê neaxaftinê bikar tîne.

Ez ketim navberê:
-Birêz dadger, ez welê nabêjim. Ez dibêjim ku bingeha darizînê tune; ji bona vê ez parastinê nakim. Ango tiştên ku tu dibêji cuda ye.

Wekî ku min rave kir, da nivîsandin û dom kir:
-Jiber daxwaznameyên ku te ji serokkomar û lijnaya mafên mirovan a meclisa Tirkîyeyê re şandiye de pesnên sûc û sûcdar daye. Te gotiye; "Serokê me birêz Ocalan! Ji ber vê ev doz li te hatiye vekirin û nêzî saleke didome.

Dadger kete nava hejmar û nimreyên dosyayê û zagonên xwe yê rezil û rizi li pey hev rêz kir. Di vê navberê de cardin bala min çû ser dimenên derve. Min dikir û nedikir nekaribûn xwe li hundirê vê eywanê bigirta. Carnan tê gotin; "Ditin û

gotin ne wekî hev e." Ez ev serê 16 salan e ku ji çîhanê, ji jiyana derve hatime qutkirin. Ez niha ku li van dimenan dinêrim, di nava labîrentên mêjûyên bêsi de li zarokati, ciwantiir û temenê ku hatiye dizin digirim. Û heta li vê sosreta giran binêrin ku ew tiştên ku ez bi salan e lê digirim, niha li ber çavên min diçûn û tên. Kijan dadgeh, kijan dadger û kijan tewanbarî dikare min ji van dimenan dîr bixe.

Li ber deriyên apartmanan du keçik û kurekî dilizin. Temenê wan li dora deh salan e. Ev çend deqeyan ku ketine nava niqaşêke dijwar. Dengê gêrgêra wan heta ba me tê. Lê fêma nabe ku çî niqaş dikin û li ser çî ye? Çiqaş dişibe rewşa vê eywanê. Ya rastî, min pir dixwest sedema niqaşê wan hîn bibim, lê ev ne gengaz e.

Çavên min bi aliyan qatên apardumanê yê jor ve çûn. Dimenekê welê balkêş li ber çavên min ket ku, bi rastî min xwe şilftazi his kir. Ji fêdiya min çavên xwe da ali. Paşê min dit ku ne tenê ez van dimenan dibinim. Min temaşeya xwe domand. Keçik û xortekî ciwan ku temenê wan li dora 20 salan bûn, hevdu himbêz kiribûn û di nava aramiyek de lêvên hev dimijiyam. Ev dimen ji min re wek pak û mehsûm hat ku min tu tişteke xerab his nekir. Tu hesûdî jî bi min re çênebû. Ev jî min re xerib hat. Ango edî di nava mêjûyê bêsi de his û hestên min, xeyal û rastiyên min jî tevlihev bûbûn û ji hev dernexistim gelo? Nizanîm!. Min tenê bi dilekî pak û bêdeng ew piroz kirin.

Xeyal û rastiyên ku ez di navê de bûm, çih guherandin. Xeyalên bist sal berê ku ez temenê xwe yê bist salî de bûm hatin ber çavên min. Di nava gul û giyayên adarê de, ez û dildara xwe li binê dara behivê rûniştibûn. Kûllikên behivê weke kuliyên berfê bi ser me de dibariyan. Mirov xwe weke di nava filmeke Qurûsawa de his dikir. Min tiliyên xwe di nava porê dildara xwe re dikir û miz dida. Porên wê yê reş, heta pişt qorikên wê dirêj dibûn. Ku min li çavên wê yê hingivîn dinêrî û porê wê miz dida, ez mest dibûm. Ku min hemû perdeyên fêdiyan radikir û xwe digihand lêvên wê yê tiji û girya, ez jixwe ve diçûm. Vanan hemû ku êrîşî giyana min dikirin, ez hema serxweş dibim û di ciyê xwe de ditevizim.

Beriya ku dadger pirs ji min bike, çavên min çûn qatên jortir. Kal û pîrekê temen dirêj xwe dabûn ber tava Sibata dana êvarê. Dadgerê pirsra xwe dubare kir:

-Tê tişteke din li gotina xwe qertaf bikî?

Min got:
-Birêz dadger, min demêke berê jî got, ji ber ku şertên parastinê tune, ez parastinê nakim... Ango tê darizînê bi dawî bikî?

Dadgerê welê bi tinaz nav û paşnavê min bilêv kir û got:
-Erê! Tu parastinê nekî jî, ezê vê dozê bidawî bikim!

Tiştêk balkêş bûn. Lê esil tişteke din ji bîra min nedîçûn. Bi rastî min wekî têkoşerekî hevalbendê jinê, jî vê jina giyanfiroti fedî kir. Wan destên wê yê ku diviya jyan biafiranda, niha pênûs weke cûzanê û xencerê diavêtin temenê min û perçe perçe ji goştê laşê min jêdikir û diavêtin devê leviathanê hun-

Leşkeran bi mirûzekî nexweş û madeyêke tîrş kelemçe li zendên min xistin û ez ber bi mêjûyên bêsi ve birim. Dê ev meş li ku, ango çawa bidawî biba nizanîm. Ya ku ez dizanim û niha his dikim êş, jan, keser û hesreta azadiya gelekî ya di hundirê xwe de ye... Û ez, niha yeke yek di rûyê gelê xwe de jana hundirê xwe dibînim.

dirê xwe. Her ku dem diçûn, çîqaş reben û biçûk dibûn.

Dadger cara dawî ji min pirsî:

-Beriya ku ez biryara xwe aşkera bikim, tişteke ku tu bêji heye?

Min dit ku parastin jixwe ji destê min çû, qet nebe du gotinên weke gurzê kalikê xwe Kawayê Hesinkar dawêşinim leviathanê hundirê wan. Naxwe ezê biteqim. Min got:

-Belê, çend gotinên min hene.

Û min rêz kirin:

- Weke ku hûn jî dizanin, min di darizîn û dosyayên cuda cuda de ji heman tiştî gotibûn. Belkî tiştên cuda tinebin lê divê cardin bêjim. Ev darizînê we ne hiqûqî, ne adil, ne li gori mafên raman û axaftinê ye. Va dozan li gori siyaseta desthilatîyê tîvê vekirin û siyasî ne. Niha hiqûq li hember me weke çek tê bikaranîn. Li ser me terora hiqûqê tê meşandin. Weke ku di doz û darizînê beriya niha de jî rave bû û niha jî di liv û lebatên dadgeriyê de xuyaye, ez li benda nêzîkbûneke erênî ninim. Dil dixwest ku dadgerî biryareke li gori hiqûqa gerdûnî bigre û bike wesîleya aşitiyê û aramiya pêvajoyê. Lê sed mixabin ez dibînim ku dê biryarên we bibin sedema şer û derbeyeke din li biratiya gelan bixe. Dê pirtir xwîn birije.

Li vê derê min li leşkeran nêrî û domand:

-Ev jî min xemgîn dike û diêşîne. Lê weke her demî tiştê ku ji bo aşitiyê bikim ev e, lê zagonêke xwezayî heye. Her tişt bersiva xwe digre, her tişt berdelê xwe heye. Ez ku dibêjim 'berdel' behsa xwe ne, behsa yê hember dikim. Ev jî ne gef e. Di vê çarçoveyê de ez biryar û dadgeha we napejirînim û red dikim. Weke ku min texmîn kir, neh meh û niv li deh mehên min ên berê zêde kir, min di dilê xwe de got, "Mirovê ku bikaribe sih salan raze, dê bist mehan jî raze.

Dadger, ji ku hat bîra wê nizanîm, di nava deriyê eywanê de ji min re got:

-Mafê te yê serlêdana dadgeheke jor heye. Di nava heftiyekê de tu dikarî serlêdanê bikî.

Min got:

-Bila tu şikê we tunebe, ezê serî lêbidim.

Ji ber ku leşkeran bi her du milên min girtibûn û dibirin, gotina min a dawî di devê min da ma. Minê bigota:

-Ezê vê dozê jî weke dozên din heta Dadgeha Mafê Mirovan A Ewropayê bibim. Ezê dûv ve bêkernamî.

Lê min dit ku dadger vê yekê nebize jî dibe. Ez bêdeng di nava leşkeran de meşiyam.

Leşkeran bi mirûzekî nexweş û madeyêke tîrş kelemçe li zendên min xistin û ez ber bi mêjûyên bêsi ve birim. Dê ev meş li ku, ango çawa bidawî biba nizanîm. Ya ku ez dizanim û niha his dikim êş, jan, keser û hesreta azadiya gelekî ya di hundirê xwe de ye... Û ez, niha yeke yek di rûyê gelê xwe de jana hundirê xwe dibînim. Ma têkoşerekî jî vê û pê ve dikare çî bixwaze? Ji vir û wê de, va ye serê kêra mêjû û va ye zikê temenê min... Hin tiştên ku çûn, dibe mirov carnan jî bide dû.

*Girtgeha Elbîstanê

Nizanibû çawa bike. Ji ber ku hevaleka wan nizanibû bi tirkî xwe bide nasandin mamoste, mamoste lê xistibû. Evin li bendê bû ku mamoste were li wê xe, lê tiştê ecêb bû ku mamoste zû hêrsa xwe daxistibû. Lê ew bûyer bû sedem ku di domahiya pênc salan de Evin qet stranan nestrê û careke din qala çûndina dibistanê neke...



Zimanê qedexeyê û evîna xwendinê

► Nesrîn NAVDAR

Dawiya sala 1986'an bû. Damsal payîz, ezman avîsê baranê bû. Evîne li odeya ku paceya wê vedibûn hêla rojhilat, di ronahiya tîrêjên nû derketî de bi peroxêke nezeftkirî û bi dengeke bilind xwe jî çûndina dibistanê re amade dikir. Ev roja wê ya yekemîn a dibistanê bû. Xeyala wê ew bû, heta dibistana bilind bixwîne û bibe mamoste. Dema mamosteyî hatibû bîra wê, heyecanê hundirê wê dagir kiribû. Ji ber ve di cihê xwe de nesekîni ku dayika wê bişkoka formaya wê ya reş biqefêle. Dayikê ew ber bi xwe ve kaş kir û bi dengekî acizbûyî got;

"De ka deqekî di cihê xwe de bisekine Evîna min. Tu wisa dikî ez nikarim bişkoka te biqefêlim."

Piştî demên bê sebir gihîşt dibistanê. Bîst deqê şûn ve ku gihîştibû dibistanê mamosteyî Tirk ew li ber nêrdewana dibistanê rêz kirin. Evin çiqas bê sebir bû ku bikeve polê û hinê alfabe yê bibe. Wê çiqas hez dikir ku hinê xwendina pirtûkan bibe. Lê wisa xuya bû niyeta mamosteyî tune bû ku wan têxe polê. Piştî ku mamosteyî ew rêz kirin ji zarokê jî pola sêyemîn re got;

"Mehmet merdivene çık, andımız oku." (Mehmet derkeve ser nêrdewanê û sondê bixwîne.)

Zarok bi awayekî bêmirûz çû ser pêla herî jor a nêrdewanê û dest bi xwendina sonda tirkî kir ku bi gotinên wek "Türk'üm, doğruyum" (Tirkim, rast im) dest pê dikir û heta dawî bi peyvenî nijadperestî hunandî bû. Zarokan tev gotina "Türk'üm" di-zani tî çî wateyê, lê pirani jî wan fêm nedikirin ku gotina dî wê ya wek "doğruyum" tî çî wateyê. Wan nedizani ku gotina "doğruyum" jî ber gotina yekemîn jî bo wan pûç dibe. Mamoste li hember wan sekinibû û bi şanidanê digot hûn jî dubare bikin. Ji ber wê piştî qedandina her hevokê wan jî li dû zarokî dubare dikir. Piştî qedandina sondê ku ketin polê mamosteyî navê wan yek bi yek bang kir;

"Firat E.," "Halime K," "Esra N. ..." Ji bilî Esrayê her kesî got; "Burdayim."

Mamosteyî navê Esra dubare kir lê tu kesî bersiv neda.

Evîne jî xwe re got;

"Wele ev paşnav wek ya me ye lê nav cuda ye."

Wê carê mamosteyî navê bav û diya Esrayê lê zêde kir, wê gavê Evîne fêm kir ku ew nav yê wê ye û hema di cih de rabû ser xwe got; "Burdayem." Lê piştî ku wê navê xwe tî dernexist hemû zarok bi carek de pê kenîyan û bû wek benîştêk di devê wan de. Evin gelek şeqizî û di cihê xwe de bêdeng rûnişt. Ji ber ku navê wê bi kurdî bû, nifûsê ew qebûl nekiribû û bavê wê jî neçar mabû ku wê wek Esra bide nivîsandin. Heta vê temenê jî kesî jê re negotibû ku navê te di nasnameyê de cuda ye.

Hefte û meh derbas dibûn û her roj sonda tirkî dubare dibûn. Evîne hêdi hêdi wateya wê fam dikir, loma êdi wê li şûna gotina tirkî bi dengekî nizm gotina kurdî bilêv dikir.

Rojeke jî rojên zivistanê berfê kirasê xwe yê sipî li hemû darên ber dibistanê kiribû û zevî seranser xemilandibûn. Zarokên pola yek, du û sêyemîn tev li dor sobeyêke tenekeyî kom bûbûn û hinekan piştî xwe germ dikir, hinekan jî lingê xwe danibûn nêzê sobeyê û goreyên xwe yê şil zuha dikirin. Dema mamoste ket hundir herkes çû li cihê xwe rûnişt. Hemû xwendekar bi kêf bûn. Ji ber ku waneya muzikê dest pê kiribû. Dersên din jî wan re pir zor dihatin. Piraniya zarokan hê jî tiştêk jî tirkî fam nekiribûn. Tenê hewl didan ku alfabe yê hin bibin, lê muzik ne wisa bû. Jiber ku kasetên bi kurdî qedexeyê bûn di mala her kesî de kasetên stranên tirkî hebûn û her tim ew guhdar dikirin û bi hêsanî jiber dikirin. Qet nizanibûna jî her zarokî stranek tirkî dizani. Loma waneya herî bi kêf û hêsan waneya muzikê bû. Her çiqas dewletê zimanê wan qedexeyê kiribû jî malbata Evîne jî tirkî di nav malbata xwe de qedexeyê kiribû, angî di malbata wê de guhdarkirina stranên tirkî qedexeyê bû. Piştî ku Helimaya hevala wê stranê got, dor hat ser Evîne. Mamosteyî got;

"Haydî Esra, seni dinliyoruz." (Hayde Esra em li te guhdar dikin.)

Evîn li mamosteyî nihêrî, pişt re li derdora xwe nihêrî û pal da kursiya xwe û jî xwe bawer strana xwe got;

"Zozan zozan zozan lê lê zozan lê lê zozan. Ref tî refê qazan lê..." Lê mamoste veciniqî, çavên wî bi nefretê hatin dagirtin, qêriya ser wê bi hêrs got;

"Kes îkes kes! Ne yapıyorsunuz! Bir daha duymayayım."

Şarkî şöyle dedim sana ne zirvalyorsun böyle!" (Bes e bes e. Tu çî dikî?! Careke din nebihîsim. Min jî te re got stranê bêje, tu çî dibêjî!)"

Hemû zarok dîsa pê kenîyan û Evin careke din li ber xwe ket û fam nekir çîma her carê ew dibe mijara henekan. Ji xwe dema deng û tevgera mamosteyî bi wê awayî dît gelek tirsîya. Nizanibû çawa bike. Hê hefteyêke berê jî ber ku zarokê hevalê wan nizanibû bi tirkî xwe bide nasandin, mamosteyî li ber çavê wan xwîn jî dev û pozê wî anibû. Evin li bendê bû ku mamoste were li wê xe, lê tiştê ecêb bû ku mamoste zû hêrsa xwe daxistibû. Lê ew bûyer bû sedem ku di domahiya pênc salan de Evin qet stranan nestrê û careke din qala çûndina dibistanê neke. Wê jî xwe re digot;

"Ger dibistana li gundê me wisa be, gelo dê li dibistana li bajar çî bîn pêşîya min. Baştir ew e ku ez nexwînim."

Sal û dem derbas bûn Evîn mezin bû, zewicî û keçeke wê çêbû. Evîne jî hêla zimên ve keça xwe Viyanê bi şans didît, jî ber ku êdi qedexeya ser zimanê wan rabûbû. Dema rêya serokwezîr û wezîrên din ên Tirkiyeyê diket welatên Ewropayê, rakirina qedexeya ser zimanê kurdî dianin ziman û pesnê demokratbûna xwe dikirin.

Rojeke jî rojên payîza 2014'yan de Evîn destê keça xwe girt û ew bir jî bo di dibistana azad de ku jî hêla Tevgera Ziman ve hatibû avakirin qeyd bike. Ew rewş jî bo Evîne wek cejneke bû. Lê piştî hefteyêkî dema perwerde hat destpêkirin dewleta ku li Ewropayê pesnê demokratbûna xwe didan, rastiya xwe nişan da û li hember dibistanên kurdî zimanê qedexeyan bi kar anî û pesnê qedexeyan nişan da. Lê tevê malbatên zarokan gelê bajêr bi biryar xwedî li dibistanê derket û piştî tîkoşîna li hember şer û gaza îso tî bi çavkirina bi ser ketin û dibistana xwe jî dagirkirina dewletê paqij kirin. Evîne jî heta dawî di berxwedanê de cih girt û keça xwe di dibistana azad de bi cih kir. Wê soz dabû xwe ku êşa ku wê di dibistanê pergala dagirkeran de dîtîye, bi keça xwe nede jiyandin. Soz dabû xwe ku dê keça xwe bi serbilindî bişîne perwerdehiya bi zimanê xwe û îro derfet ditibû ku wê soza xwe pêk bîne. Wê fêm kiribû ku kesek mafên mirov di tepsiya zêrin de nade ber mirov. Ger mafekî te hebe nexwaze bigre, an jî tu bixwe ava bike. Erênîya wê awayê Evîne îro bi çavên xwe ditîb. Ew jî bo wê têrî dikir ku bawer bike ku azadiya wan nêze.

Li welatê min
Dayîkî fîm "Cudayîyê" fînin dînê
Navê "Bêrî", "Hesret" lê dîkin
Herduyan cuda nakîn.
Her duyan bi sebir û înan mezin dîkin,
Weke keçek û kurek in.
Her ku ew mezin dîbin,
Êşa dil mezin dibe.
Rojê
Dayîkî jî nû ve ducanî dîbin
Vê carê "Hêvî" fînin dînê
Navê wê dîkin "Azadî"
Navê wê bi çêş û hezkîrim mezin dîkin
Her ku ew mezin dîbin
Êşa dil dadikeve.

SAKÎNE CANSIZ

